# Bultena heftane

# 27/1/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## [Encamnameya Konferansa 'Jin, Jiyan, Azadî' hate eşkerekirin]

Desteya Amadekar a Konferansa 'Jin, Jiyan, Azadî' ku di dîroka navbera 20-21'ê Çile de li bajarê Stockholmê yê Swêdê hate lidarxistin, bi daxuyaniyekê encamnameya konferansê eşkere kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/encamnameya-konferansa-jin-jiyan-azadi-hate-eskerekirin-43396

Çavkanî:JINHA



## [Li Parlamentoya Ewropayê konfaransa jinên Êzidî tê lidarxistin]

Li Parlamenta Ewropa bi sernavê 'Jinûve avakirina civaka Êzidî ya di bin gefa qirkirinê de ye' konferansek tê lidarxistin. Di konfaransê de bal li ser êrişên dewleta Tirk ên li ser Şengalê hat kişandin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-parlamentoya-ewropaye-konfaransa-jinen-Ezidi-te-lidarxistin-43432

Çavkanî:JINHA



## Li Fransayê ji bo mafê kurtajê garantiya destûrî

Meclisa Neteweyî ya Fransayê pêşnûmeya ku mafê jinan ê kurtajê bi destûra bingehîn tê misogerkirin qebûl kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-fransaye-ji-bo-mafe-kurtaje-garantiya-desturi-43452

Çavkanî:JINHA



## Li Cezayîrê li dijî şîdeta dîjîtal ji bo sererastkirina zagonê projeyek nû

Seroka Komeleya Djazairouna Şerîfa Khoddar, diyar kir ku armanca wan ew e li dijî şîdeta dîjîtal a li dijî jinan zêde dibe, gotinên bi nefret û cudakariyê zagon derkeve û di vê çarçoveyê de dest bi projeyek kirine.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-cezayire-li-diji-sideta-dijital-ji-bo-sererastkirina-zagone-projeyek-nu-43375

Çavkanî:JINHA



## Halîde Turkoglu: Dema em bi ser bikevin wê jin bi ser bikevin

Berdevka Meclîsa Jinan a Partiya Wekhevî û Demokrasiyê (DEM Parti) Halide Turkoglu di civîna Hevserokên Bajêr ên Jin de axivî û got: “Dema em bi ser bikevin wê jin bi ser bikevin. Dema avakirina bajarên azad hat."

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/tulay-hatimogullari-dema-em-bi-ser-bikevin-we-jin-bi-ser-bikevin-43377

Çavkanî:JINHA



# [Jinên Tûnisî bi xebata di fabrîkayên xurmeyan debara xwe dikin](https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-tunisi-bi-xebata-di-fabrikayen-xurmeyan-debara-xwe-dikin-43379)

Jinên li bajarê Tuzer ê başur rojavayê Tûnisê di fabrîkayên xurmeyan de dixebitin, diyar dikin ku ew bi xebatê di warê aborî de azad dibin.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/jinen-tunisi-bi-xebata-di-fabrikayen-xurmeyan-debara-xwe-dikin-43379

Çavkanî:JINHA



# [Li Iraqê di 10 salan de zewaca zarokan zêde bûne](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-iraqe-di-10-salan-de-zewaca-zarokan-zede-bune-43392)

Parêzvanên mafên jinan li ser zêdebûna zewacên zarokan di van 10 salên dawî de li Iraqê dinirxînin ku ji bilî yasayan divê ji bo guhertina zîhniyetê jî hewl bê dayîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-iraqe-di-10-salan-de-zewaca-zarokan-zede-bune-43392

Çavkanî:JINHA



## Bijîşka ji Bîngazî: Di perwerdeyan de girîngî didin bijîşkên mêr

Bijîşk Yasmîne Ramazan Fayyad a li nexweşxaneyek Bîngazî dixebite diyar kir her çend 5 sal in dixebite jî, bijîşkên jin hê jî nikarin bikevin emeliyata dilê a vekirî û wiha got: "Mixabin bi gelemperî di perwedeyan de girîngî didin mêran.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bijiska-ji-bingazi-di-perwerdeyan-de-giringi-didin-bijisken-mer-43394

Çavkanî:JINHA



## Li Efganistanê cenazeya 7 jinên bi îşkenceyê hatine qetilkirin hat dîtin

Li Efganistanê Talîbanê, dest bi binçavkirina jinên ku li gorî qurala hicabeyê ferzkirî tevnegerîn kir. Hate diyarkirin ku hin jinên hatine binçavkirin bi îşkenceyê hatine qetilkirin û li Kabîlê cenazeyên 7 jinên rastî îşkenceyê hatine, hat dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-efganistane-cenazeyen-7-jinen-bi-iskenceye-hatine-qetilkirin-hate-ditin-43395

Çavkanî:JINHA



## ‘Cil û bergên kevnar wek belgeyeke di dîrokî de tên xwendin’

Sanbel Şoceyî ya ku ji bajarê Urmiyê ye qala parastina cil û bergên Kurdî kir û wiha got: “Di cil û bergên Kurdî yên çandî de ezmûnên bi hezaran salan hene ku nifş bi nifş hatiye ragihandin.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/cil-u-bergen-kevnar-wek-belgeyeke-di-diroki-de-ten-xwendin-43399

Çavkanî:JINHA



## Li Kenyayê jin li dijî tundî û qetilkirina jinan daketin qadan

Li paytexta Naîrobî ya Kenyaye bi hezaran jin li dijî tundî û qetilkirina jinan a demên dawî de zêde bûye meş pêk anîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-kenyaye-jin-li-diji-tundi-u-qetilkirina-jinan-daketin-qadan-43403

Çavkanî:JINHA



## Gulê Ozek çanda vegotina çîrokan li Mexmûrê zindî dihêle

Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) çanda vegotina çîrokan jî ji aliyê dayik û jinên wargehê ve tê berdewamkirin. Yek ji wan jinan jî Gulê Ozek e, çîrokên ji dayika xwe fêr bûye niha ji zarokên xwe re dibêje.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/gule-ozek-canda-vegotina-cirokan-li-mexmure-zindi-dihele-43406

Çavkanî:JINHA



## Sepana 'Ev Mafê Wê ye' hişmendiyê zêde dike

Rêxistina Parastina Wekhevî û Maf a Lubnanê, dixwaze bi sepana "Ev Mafê Wê ye" cudakariya li dijî jinan ji holê rake û der barê mafên jinan de hişmendî zêde bike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/sepana-ev-mafe-we-ye-hismendiye-zede-dike-43409

Çavkanî:JINHA



## Doza Sakîne Kultur bi awayekî ji edaletê dûr berdewam dike

Danişîna biryarê dê ji bo doza Îbrahîm Barkin ê bi îşkenceyê Sakîne Kultur qetil kir, bê dîtin. Parêzer Oyku Çakmak, diyar kir ku di dozê de gelek mijarên nediyar nehatine lêkolînkirin û got: “Darizandin bi awayekî ku edalet pêk neyê berdewam dike.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/doza-sakine-kultur-bi-awayeki-ji-edalete-dur-berdewam-dike-43412

Çavkanî:JINHA



## ‘Bernameya Nexşeya Femînîst’ li Misirê hat destpêkirin

“Bernameya Nexşeya Femînîst” ku ji hêla Weqfa Ragihandinê ya Pêşketinê (ACT) a li Misrê ve hat destpêkirin armanc dike ku tevgerek femînîst a ciwan û nûjen ava bike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bernameya-nexseya-feminist-li-misire-hat-destpekirin-43415

Çavkanî:JINHA



# DEM’ê namzedên xwe yên jin eşkere kir

Berdevka Meclisa Jinan a DEM’ê Halîde Turkoglu di çalakiya danasîna namzedên hevşaredarên jin de axivî û got: “Hevserokatî xeta me ya binefşî ye, sedema têkoşîna me ye.”

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/dem-e-namzeden-xwe-yen-jin-eskere-kir-43416

Çavkanî:JINHA



# Banga Esma Ayaz ji girtîgeha jinan a şakranê

Esma Ayaz a 23 sal in girtiye bi çarçoveya pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî" dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiriye bang li gel, li nivîskar, rewşenbîr, hunermanda kir ku tiştên dikeve ser milê xwe bi cih bîne."

https://hawarnews.com/kr/banga-esma-ayaz-ji-girtigeha-jinan-a-sakrane

Çavkanî:ANHA



## 2 sal û 8 meh cezayê girtîgehê ku dayîn Şebnem Korur Fîncancî, hat erêkirin

Cezayê 2 sal 8 meh û 15 roj ê girtîgehê ku dabûn Seroka TTB'ê Şebnem Korur Fîncancî ji aliyê dadgeha Îstinafê ve hat erêkirin.

https://rojnews.news/ku/?p=303083

Çavkanî:ROJNEWS



## Dayîkên Mexmûrê: Divê Iraq pêşiya qetilkirina jinan bigire

Dayîkên Wargeha Mexmûrê têkildarî qetilkirina siyasetmedar, şoreşger û têkoşera 31 salan Firyal Silêman Xalid (Zelal Zagros) ku di 18`ê Çileyê de li Kerkûkê hatibû qatilkirin, şermezar kirin û bang li hikumeta Iraqê kirin ku pêşiya qetilkirina jinan bigire.

https://rojnews.news/ku/?p=303418

Çavkanî:ROJNEWS



# Bi fîstan û klamên xwe bang li jinan dike

STENBOL - Dengbêje Guloş Bêrtî ku zaroka malbatek koçer bû ji dayika xwe ya dengbêj bandor dibe û çanda xwe heta îro tîne. Guloş wiha dibêje: “Çavkaniya ilhama me jin in. Xwedîderketina li çanda xwe, xwe rastiya xwe durneketine. Di serî de jin divê hemû civak di bin dengê me de kom bibin.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/225827?page=2

Çavkanî:JINNEWS



# Çawa dibe ku bi hêsanî xwe digihînin çeka suîkastê?

STENBOL - Jinan bertek nîşanê Nazli Elman a ku ji aliyê gumanbar Enîz Kurtuluş ve bi çeka suîkastê ve hat qetilkirin û gotin: “Çawa hêsan xwe gîhandiye vê çekê? Divê ev bê lêkolînkirin. Rayedar berpirsyariya xwe naynin cih. Hikûmeteke ku destura bingehîn û hiqûqê nas nake heye. Li dijî vê hêza me ya rêxistinkirî heye. Ji bo kuştinên jinan bên rawestandin em ê têkoşîna xwe bidomînin.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/225891?page=2

Çavkanî:JINNEWS




## Medyaya ku ji derewên xwe bawer dike!

NAVENDA NÛÇEYAN - Medyaya alîgir a ku qetilkirina 320 jinan a sala 2023’yan nedîtiye, serbestberdana kujer û êrişkaran nekiriye nûçe, xizanî, bêkarî, destdirêjiya li hemberî jinan nexistiye rojevê, bi nêzbûna hilbijartinê re jî pesnê projeyên îktîdarê yên derbarê jinan de dide.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/225893?page=2

Çavkanî:JINNEWS




## Ji bo girtiyan lîstika ‘Mirin di Xewê de bû’

AMED - Li Amedê ji bo girtiyên siyasî lîstika şanoyê ya “Mirin di Xewê de bû” hate lîstin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/225939?page=1

Çavkanî:JINHA



## Desthilatdariya butçeyê ji şer re vediqetîne jinan nabîne

STENBOL - Butçeya 2024’an ya di meha kanûnê de hat qebûlkirin nîqaşên wê didomin. Jinan diyar kirin ku butçe û çavkanî ji şer û çekan re tê veqetandin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/225953?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Li Dîlokê tundiya mêr

DÎLOK - Halîl Çaglar, hevjîna xwe Yuksel Çaglar û 2 birayên wê qetil kirin, xwişka Yuksel û keça xwe jî birîndar kirin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/225992?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## Hunermenda Kurd Emel Çîftçî: Ez ê bê dudilî axaftina xwe bidomînim

Hunermenda Kurd Emel Çîftçî ku piştî 5 mehên girtî mayînê di danişîna ewil de hat berdan, diyar kir ku divê li hemberî girtiyên nexweş û tecrîdê hesasiyeteke mezin derkeve holê û got: "Weke hunermendeke Kurd ez ê bê dudilî dengê xwe bidomînim."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hunermenda-kurd-emel-Ciftci-ez-e-be-dudili-axaftina-xwe-bidominim-43423

Çavkanî:JINHA



## Hiqûqnas Aişa Kalaa: Ji bo temsîliyeta wekhev divê kota were pêkanîn

Seroka Koordînasyona Parêzerên Jin a ji bo Wekeheviyê Aişa Kalaa, bal kişand ku di rêxistinên hiqûqê de ji ber zihniyeta mêr temsîliyeta jinan tune ye û diyar kir ku divê kota were pêkanîn û li gorî peymanên navneteweyî sererastkirin çêbibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hiquqnas-aisa-kalaa-ji-bo-temsiliyeta-wekhev-dive-kota-were-pekanin-43425

Çavkanî:JINHA



## ‘Li dijî tundiyê divê rêxistinên jinan yek bin’

Berpirsa beşa civakî û sekretera Yekitiya Jinan Eyşe Abdulhekîm bal kişand ku tundiya li ser jinan her diçe zêde dibe û anî ziman ku ji bo pêşî li tundiyê bê girtin divê rêxistinên jinan di xebat û têkoşîna li dijî tundiyê de yek bin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-diji-tundiye-dive-rexistinen-jinan-yek-bin-43426

Çavkanî:JINHA



## Şer jinan hem ji mal û hem jî ji çavkaniyên jiyanê bêpar hişt

Li Libnanê jinên ku ji ber êrîşên Îsrailê ji malê xwe bûne li dibîstanên ku xwe spartinê di şert û mercên zehmet de jiyana xwe berdewam dikin, diyarkirin ku ji ber êrîşan ji çavkaniyên jiyanê jî bêpar bûne.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Ser-jinan-hem-ji-mal-u-hem-ji-ji-cavkaniyen-jiyane-bepar-hist-43428

Çavkanî:JINHA



## 'Divê xebatên hunera dikê ji rêzê neyên dîtin'

Jinên di qada hunera dikê de cih digrin diyar dikin ku bi awayekî xurt dixebitin û hebûna xwe nîşan didin û dibêjin ku divê xebatên hunera dikê ji rêzê neyên dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/dive-xebaten-hunera-dike-ji-reze-neyen-ditin-43429

Çavkanî:JINHA




## Li Agiriyê jinekê bi gûman jiyana xwe ji dest da

AGIRÎ - Li Agiriyê jina bi navê S.O. bi awayê bi gûman jiyana xwe ji dest da.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226106

Çavkanî:JINNEWS



## Gulistan Kiliç Koçyîgît: Çi dibe bila bibe emê bi meşin

Serokwekîla Koma DEM Partiyê Gulistan Kiliç Koçyîgît ji bo tevlibûna 'Meşa Mezin a Azadiyê' ku wê bi daxwaza azadiya fîzîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê destpêkirin banga tevlibûnê kir û diyarkir ku çi dibe bila bibe wê bi meşin.

https://jinhaagency.com/ku/siyaset/gulistan-kilic-kocyigit-Ci-dibe-bila-bibe-eme-bi-mesin-43449

Çavkanî:JINHA



## Ji bo kesên nabihîsin zimanê îşaretê fêr bû piştre komeleyê ava kir

Li Mortînyayê ji bo kesên astengdarên bihîstinê,Lalla Kaber destpêkê zimanê îşaretê fêr bû, piştre rêxistina Xizmetê ya Civakî ya Rama ava kir, ji bo kesên astendarê bihîstinê bi civakê bidin qezenc kirin û ji bo hişyarkirinê xebatên girîng didin meşandin

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-bo-kesen-nabihisin-zimane-isarete-fer-bu-pistre-komeleye-ava-kir-43447

Çavkanî:JINHA



## Bi projeya ‘Tevna Femînîst’ re rêxistinên jinan tên piştgirî kirin

Ji projeya ‘Tevna Femînîst’ ku di sala 2023’an de li Misrê hate avakirin re 17 komên femînîst tevlî bûn.Rêvebirên projeyê ku diyar kirin bi projeyê re dîtin pêdiviyên komên femînîst cudaye û destnîşan kirin rêya avakirina tor a di navbera koman de vebûye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/bi-projeya-tevna-feminist-re-rexistinen-jinan-ten-pistgiri-kirin-43446

Çavkanî:JINHA



## Bi projeyên Rêxistina Tuwanasaziya Jinan ciwan dibin xwedî karê xwe

Rêxistinên jinan ên başûrê Kurdîstanê ji bo krîza aborî li ser civakê sivik bikin hinek projeyan pêş dixin yek ji wan saziyan jî Rêxistina Tuwanasaziya Jinan ê. Berpirsa rêxistinê Sûzan Ferec diyar kir ku bi projeyan derfetên kar ji bo ciwanan ava dikin.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/bi-riya-projeyen-rexistina-tuwanasaziya-jinan-ciwan-dibin-xwedi-kare-xwe-43442

Çavkanî:JINHA



## [Li Rabatê lîstika bi navê "Ji Ber Şer Jin Nîn e' hat pêşkêşkirin](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-rabate-listika-bi-nave-ji-ber-Ser-jin-nin-e-hat-peskeskirin-43441)

Di Festîvala Derhênerên Jin a Navneteweyî ya Jasad ku li Rebatê hat lidarxistin de ji aliyê Civaka Şanoyê ya Yewnanistanê "Mixabin" ve lîstika şanoyê ya bi navê "Ji Ber Şer Jin Nîn e" hat pêşkêşkirin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/li-rabate-listika-bi-nave-ji-ber-Ser-jin-nin-e-hat-peskeskirin-43441

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Antakyayê bi piştevaniyê birînên erdhejê dikewînin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-antakyaye-bi-pistevaniye-birinen-erdheje-dikewinin-43439)

Yek ji dilxwazên Piştevaniya Erdhejê ya Hatayê Cansel Aslan, diyar kir ku di pêvajoya ji nû ve avakirina piştî erdhejê de ji bo beşdarbûna jinan a jiyana civakî xebatên xwe didomînin û bal kişand ser hêza piştevaniyê ya ku baş dike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-antakyaye-bi-pistevaniye-birinen-erdheje-dikewinin-43439

Çavkanî:JINHA



## ‘Rojeva hilbijartina herêmî wek rojeva şer hat nîqaşkirin’

BURSA - Ji Komeleya Havle Rumeysa Çamdereli derbarê hilbijartinên herêmî de rojeva jinên oldar yên musliman ji jinên din cudatir nîne û got: “Stargeh, xwegîhandina mekanîzmayên edaletê, kreş, veguhestina bi ewle ev hemû rojevên me yên hevpar in.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226231?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## 'Ev sedsal a jinan û gelê kurd e'

AMED - Rêxistina DEM Partiyê ya Amedê têkildarî hilbijartinên xwecihî daxuyanî da û wiha got: “Ev sedsal a jinan û gelê kurd e. Dem dema şandina qeyûman e.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226263?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## KCDP: Di meha çileyê de 31 jin hatin qetilkirin

STENBOL - Di rapora KCDP'ê ya meha çileyê de, hat diyarkirin ku 31 jin hatine qetilkirin û 21 jinî jî bi awayê bi gûman jiyana xwe ji dest dane.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226264?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Li Amed û Stenbolê tundiya mêr

AMED/ STENBOL- Li Stenbolê mêrê bi navê Mustafa Guler jina bi navê Katîe Erorbay bi çekê qetil kir. Li Amedê jî mêrê bi navê Veysî Çîçek jina bi navê Dîlan K.bi çekê bi giranî birîndar kir.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226287?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## [Parêzer Eren Keskîn: Tecrîda li ser Ocalan tê meşandin biryarek polîtîk e](https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-eren-keskin-tecrida-li-ser-ocalan-te-mesandin-biryarek-politik-e-43456)

Parêzvana mafan û parêzer Eren Keskîn diyar kir ku meşandina tecrîdê ji aliyê dewleta Tirk ve, tercîheke polîtîk e û wiha got: "Tecrîd rewşeke li dijî mafên mirovan e û pêvajoyek kaotîk bi xwe re tîne."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-eren-keskin-tecrida-li-ser-ocalan-te-mesandin-biryarek-politik-e-43456

Çavkanî:JINHA



## [Derhêner Nûra Amîn: Bedenên me parçeyek ji nasnameya me ne](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/derhener-nura-amin-bedenen-me-parceyek-ji-nasnameya-me-ne-43457)

Nivîskar û derhênera Misrî Nûra Amîn ku beşdarî Festîvala Derhênerên Jin a "Jasad" bû, der barê lîstiko şanoyê ya bi navê "Reqsa min" de axivî û wiha got: “Bedenên me parçeyek ji nasnameya me ye û divê em wan veşêrin û ji wan netirsin.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/derhener-nura-amin-bedenen-me-parceyek-ji-nasnameya-me-ne-43457

Çavkanî:JINHA



## [‘Divê dê û bav bi baldarî li hal û tevgera zarokên xwe binêrin’]

Li Tûnisê, hejmara jinên dixebitin zêde dibe, bi vê re bexçeyên zarokan jî li welat zêde dibin. Psîkolog Enas Ben Salîma got ku divê dê û bav li tevgerên zarokên xwe yên ku dişînin bexçeyên zarokan an jî pêşdibistanê bi baldarî binêrin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-de-u-bav-bi-baldari-li-hal-u-tevgera-zaroken-xwe-binerin-43458

Çavkanî:JINHA




## [Li Kunarê hê jî şopên qetlîam û berxwedanê hene!]

Li Kunarê ku yek ji parêzgehên rojhilatê Efganistanê ye; nêzî 40 sal in şahidiya sûcên kedxwar û hikûmetan dike, li aliyekî ve jî şopa komkujiyên kedxwaran heye û li aliyê din ve jî şopa hêzên demokratîk tê dîtin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-kunare-he-ji-sopen-qetliam-u-berxwedane-hene-43460

Çavkanî:JINHA



# Amîne Xan, 34 salin dîrok û çandek kevnar diparêze

Ji ber serdema nû şûnwarên çandî û dîrokî tune dibin. Lê Amîne Xan a Hemamçî ya ku bi salan e xizmeta Hemama Miftî dike, dibêje heta ku ew sax be, ew ê nehêle ev cih ji holê rabe.

https://rojnews.news/ku/?p=303777

Çavkanî:ROJNEWS



**Nûçeyên herêmî**

## Faraşîn Hêzda ya enternasyonalîst: Li Kobanê mirovahî hat parastin

Faraşîn Hêzda ya ji Elmanyayê yek ji wan jinan e bi têkoşîn û berxwedana jinan a li Kobanê çîroka wê jî bi Kobanê re dibe yek. Faraşîn Hêzda dibêje: “Li Kobanê mirovahî hat parastin” û banga li dijî hemû êrîşan parastina Kobanê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/farasin-hezda-ya-enternasyonalist-li-kobane-mirovahi-hat-parastin-43389

Çavkanî:JINHA



## 'Divê em feraseta mêr ku jin û xwezayê kedxwarî dikin biguherînin'

Endama Akademiya Jineolojiyê Alya Osman, diyar kir ji bo bibin parçeyek ji xwezayê û bi wê re bijîn divê jiyana azad bê bidestxistin û wiha got: “Divê feraseta mêr ku jin û xwezayê kedxwarî dikin bê guhertin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-em-feraseta-mer-ku-jin-u-xwezaye-kedxwari-dikin-biguherinin-43391

Çavkanî:JINHA



## Jinên Efrînî:Bi êrîşan nikarin me qir bikin

Efrîniyên ku ji ber êriş û dagirkeriya dewleta Tirk koçî Şehbayê bûne carekî din nerazîbûnên xwe li hember êrîşên dewleta Tirk nîşandan û diyar kirin ku tu êrîş û dagirkerî nikare vîna wan bişkîne, ji ber ku ew Kurd in.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-efrini-bi-erisan-nikarin-me-qir-bikin-43407

Çavkanî:JINHA



## 'Divê nivîskar li dapîr û bapîrên me bigerin'

Merdiya Elî Ibrahîm a 61 salî ji navçeya Amûdê çîrokên ku dayik û dapîrên xwe girtibûn parve kir û wiha got: "Divê nivîskar li dapîr û bapîrên li gundan bigerin."

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/dive-niviskar-li-dapir-u-bapiren-me-bigerin-43422

Çavkanî:JINHA



## Li Reqayê bi hostebûna hunerên destan îlhamê didin jinan

Julia Abû Zar û Hatîce Al-Mazal ên li Reqayê bi projeyên ku bi hostebûna hunerên destan re çêdikin ji bo gelek jinan dibin îlham, peyam dan ku her gava jinan a biserketî sûd dide refaha civakê.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-reqaye-bi-hostebuna-huneren-destan-ilhame-didin-jinan-43424

Çavkanî:JINHA



## Li Efrînê jinek û keça wê hatin revandin

NAVENDA NÛÇEYAN - Komên girêdayî dewleta tirk li Efrînê jinek û keça wê revandin.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/226262?page=1

Çavkanî:JINNEWS



Kongra Star

2/2/2024